**Encamnameya Deklerasyona Foruma Avê ya 2yemîn a Mezopotamyayê**

**Amed**

## Ji Bo Pêşeroja Avê ya Li Mezopotamyayê Bi Vîna Gel Teşegirtî;

## 'Bi Avên Me Digihînin Hev , Ber Bi Jiyaneke Hevpar Ve!'

Em, wek beşdarên Foruma Avê ya 2'yemîn a Mezopotamyayê; di serî de beşdarên ji Türkiye, Sûriye, Îran û Iraqê û ji erdnîgariya Kurdistanê ya di nav sînorên van dewletan de û ji neh welatên cuda, zêdetirî sêsed çalakvan, akademîsyen, lêkolîner, xwendekar, jin, rêxistinên ekolojiyê û nûnerên rêveberiyên xwecihî , di 17-19'ê Cotmeha 2025'an de li ber çemê qedîm ê Dicleyê, li Amedê civiyan.

Li vê erdnîgariyê av hêmana herî bingehîn a jiyanê ye û pêşeroja Mezopotamyayê ji rêxistinkirina û parastina heremênên (havzayên) avê derbas dibe. Li ser vê bingehê, bi tevlêbûna çalak a pêkhateyên forumê, di sê sernavan de komên xebatê hatin avakirin:

- Bingeha tekoşîna hevbeş ya av, aştî û azadiyê
- Rêvebirina avê ya li gorî demokrasî-ekolojiyê, azadkirina heremên avê,
- Dîplomatiya avê ya gelan.

Polîtîkayên kapîtalîzm, endustriyalîzm û netewdewletan , li ser qadên jiyana me desthilatdarî û metîngeriyê pêş dixin; ev rewş krîzên ekolojiyê û civakî kûrtir dikin. Li ser rûyê erdê tu qadekê nahêle ku neke qurbankirina berjewendiya zêde ya qezencê, lê erdnîgariya Mezopotamyayê ya di nav qadên jiyanê yên ku ji aliyê cihêrengiya biyolojîk ve xwedî îmkanên jiyanê yên gelekî guncav e û yek ji jîngehên pêşîn ên civakbûna mirovahiyê ye ku herî zêde ji van krîzan bandor dibe.

Li erdnîgariya me hilweşîna hêmanên xwezayî û çandî, kûrbûna krîza îklîmê, qirêjiya endustriyel û polîtîkayên ewlehiyê yên herêmî, li ser çemên Dicle û Firatê zextên giran dikin û di heremên avê de jiyan tê talankirin. Çem ji bo avakirina jiyaneke hevbeş, yekbûna ekolojiyî, edaleta civakî û aştiya mayinde, rênîşandarên bingehîn ên jiyanî ne. Lê belê îro, bi polîtîkayên deshilatdaran ên hêz û bêplan ên pêşerojê re, bûne 'tiştek/nesne' ku serdestiya li ser wan tê pêşxistin û bûne amûrên polîtîkayên kolonyalîst.

Bi projeya GAPê (Projeya Anatoliyaya Başûrê Rojhilat) ya ku bi salan e bi honakeke navendî û çavê sermayeyê tê domandin, avê bi navê pêşxistina herêmî vediguherîne qadeke projeyê ya ku weke amûrê kirîn û firotinê be. Ev nêzîkatî krîza avê hîn kûrtir dike.Zincîrebendav herikîna xwezayî ya çeman dibire, çandiniya malbatî ya biçûk tasfiye dike. Di heman demê de newalên fireh û deştan di bin avê de dihêle û ekosîstem û qadên jiyanê tune dike.

Di herêmên avê yên herikîna ber bi jêr de ev yek dibe sedema zêdebûna şorbûna axê û hilweşîna aboriya debarê. Ev veguherîn hem ciwanên herêmê ber bi bêkariyê ve dibe û girêdayiyeke aborî ya nû çêdike.Gelên ku bi axa xwe debar dikin bêax dihêle û bi zorê

koçber dike. Polîtîkayên şerê taybet ên sîstemîk ku bi salan e didomin, tahribata civakî û ekolojiyê kûrtir dikin.

Li Mezopotamyayê em avê û çeman winda dikin. Pêşeroja avê li vê erdnîgariyê jiyana hevbeş a hemû gelên ku lê dijîn e. Mînak, tenê li herêma Kurdistanê ya di bin sînorên Îranê de (Rojhilat) 1300 bendav û 120 hezar kaniyên sondajê hebûna avên binerdê tune dik; li hawzaya avê ya Mezopotamyaya li Tirkiyeyê jî newalên Munzur, Zîlan, Botan, Murat, Dicle û Zapê bi sedan bendavan bi berdewamî tên talankirin. Ev rewş bixwe jî firehiya krîza avê ya herêmî bi awayekî eşkere nîşan dide. Di herêmên avê yên Dicleyê û Firatê de şerên ku tên meşandin, sepandinên ewlehiyê, proje yên bendav û HES'an wekî projeyên ku çerxa ekolojiyê ya çeman perçe dikin, di rûpelên tarî yên dîroka cîhanê de cihê xwe girtine.

Tam ji ber vê sedemê weke di Foruma Avê ya 1emîn a Mezopotamyayê de, di foruma Avê ya 2yemînya Mezopotamyayê de jî; rêxistinkirina bertekên xurt ên li hemberî wêranîya ku ji ber qutkirina hebûna avê ji jiyanê û hiştina wê bi têkiliyên bazarê û dewletan re, rêxistinkirina parastina mafê jiyana avê ye.Di heman demê de li dijî projeyên sermayê, zextên jeopolîtîk û veguherandina avê bo amûreke kontrolê em hatin cem hev.

Me li ser van xalan li hev kir ku vîna gel dikare azadiya avê mîsoger bike û pergala mêtîngeriyê veguherîne. Palpişta herî bingehîn a ku polîtîkayên avê yên adilane ava bike, kombuna zanîna jin, cotkar, şivan û gelên ji jingehên xwe hatine koçberkirinê ye.

Çemên sînoran derbas dikin çawa sînorên hatine xêzkirin bêwate kirine, gelên ku di herêmên avê de dijîn jî wê bi nasnekirina sînoran jiyana hevbeş û têkoşîna avê mezin bikin.

Jidilbûna jinan a di têkoşîna avê de û têkiliya çandî û baweriyê ya gelên Mezopotamyayê bi avê re, bîra(hafizaya) herî xurt a vê xetê ye.

Ev deklarasyon encama nîqaşên sê rojan, êşên parvekirî, hêvî û îradeya hevbeş e.Banga ku ji vir bilind dibe, rêwîtiya vîna mezinkirina biazadî herikîna avê, jiyana hevbeş a gelan û parastina aştîya pêşerojê ye. Em dixwazin diyar bikin ku vîna hevbeş a di Foruma Avê ya 1'emîn a Mezopotamyayê de ya li Silêmaniyê ku li dijî avê kirina asta amûrê kirîn û firotinê, bikaranîna avê wekî çek û polîtîkayên hegemoniya herêmî hatibû avakirin, îro li Amedê ev vîn mezintir bûye û ev vîn hê jî rêgeza bingehîn e ku rê nîşanî têkoşîna me dide.

### Li Ser Rihê Forumê

Foruma Avê ya 2'yemîn a Mezopotamyayê bi hêza kolektîf a hevgirtinê û bi nihêrîneke rexneyî ya li hemberî desthilatdariyê û zimanê desthilatdariyê berdewam kir.

Di hemû rûniştinên tematîk, atolye û nirxandinên hevbeş de azadiya avê esas hate girtin. Ev yek careke din nîşanî me da ku krîza avê li vê erdnîgariyê ji pirsgirêkek teknîkî gelekî zêdetir e. Di encama nîqaşên forumê de fikra hevbeş a derketî holê ev bû: Krîza avê ya li Mezopotamyayê ne tesadufî ye. Ev krîz encama projeyên berhevkirina sermayê, polîtîkayên ewlehiyê û şêwazên rêveberiya mêrsalariyê e.

Li herêmeke ku bi pevçûnan tê bibîranîn, bi tecrûbe me dît ku gel dikarin bi hev re gotinê ava bikin û hevgirtin pêkan e. Nîqaşên ku hatin kirin hêza vîna ji binî ve bilindbûyî derxist holê.

Di forumê de herwiha nîqaşên kûr li ser etîka avê, rêxistinkirina horizontal, ragihandina avê ya demokratîk, damezrandina akademiya ekolojiyê ya azad û rola perwerdeyê di avakirina hişmendiya civakî de hatin kirin. Van nîqaşan derxistin holê ku têkoşîna avê divê li ser xetekê enternasyonal bê meşandin.

**Banga me: Çeman ji destên dagirkeran rizgar bikin**

Em bi biryar in ku avê û jiyana ku bi wê ve girêdayî ye azad bikin. Em herikîna ava Dicle û Firatê ya ku hatiye rawestandin, polîtîkayên kolonyalîst ku avê heps dikin û mîlîtarîzma ku herêmên avên me dorpêç kiriye, bi temamî red dikin.Azadiya çeman, azadiya gelên Mezopotamyayê ye.

Dema av azad bibe, civak jî azad dibe. Dema herikîna çeman bê rawestandin, dîrok, bîr û çand jî zuha dibin. Em vê "zuhabûnê" red dikin. Em dizanin ku krîza avê ne "qeder" e, bi bijartinên siyasî hatiye av hatiye hepskirin û em ji bo bidawîkirina vê girtîbûna avê vînekê hevbeş ava dikin.

Pêşniyarên ku me li jêr pêşkêş kirine, aqilê kolektîf ê gelan e. Ji bo bicihanîna van pêşniyaran, em li hemû rêveberiyên xwecihî, meclîsên civakan, rêxistinên ekolojiyê, odeyên pîşeyî, saziyên jinan, akademiyê û hemû aktorên ku li seranserê herêmên avê têdikoşin, banga bicihanîna berpirsiyariyên xwe dikin, Ev bang ne tenê daxwazek e, vexwendina têkoşîna polîtîk a bibiryar e.

1. **Riya Çeman a Ber Bi Aştiyê**

Em îlan dikin ku azadiya çeman û aştiya mayinde di heman xeta têkoşînê de ne. Li hemberî parçebûna vê erdnîgariyê, em civaka demokratik û azadiya jiyanê diparêzin. Herikîna Dicle û Firatê nîşanî me dide ku çem ne tenê xetên avê yên ji sînor derbas dibin, ew pêwendîdarên herî xurt ên aştiyê ne ku paşeroj, îro û pêşeroja gelan bi hev ve girê didin.

Azadkirina çeman, şikandina zincîrên desthilatdariyê ye ku jiyanê talan dikin. Ev têkoşîn, sazûmaniya desthilatdariyê ya ku av û herêmên avê dike amûrê kirîn û firotinê û berhevkirina sermayê, red dike. Ew xwe dispêre etîka avê ya ku mafên jiyanê esas digire û li ser bingeha aştî ya ku bi mafê gotinê yê kolektîf ê gelan tê avakirin. Ev rêwîtiyeke ku bi vîna hevpar a gelan tê honandin. Em biryardar in ku em bibin avakerên vê rêwîtiyê.

**1.1 Li Dora Çeman Aşti û Hevgirtinê Honandin**

Aştî li seranserê herêmên avê dadwerî û azadiya civakî tîne û di heman demê de astengiyên li ber herikîna avê radike. Her pevçûn û her destwerdana ku herikîna avê asteng dike, pêşeroja Dicleyê û Firatê tarî dike. Ji ber vê yekê, aştiya mayinde ya li Sûriyê ku hemû pêkhateyan bigire nav xwe, li Iraqê aramiya civakî, li Îranê vekirina deriyê demokrasiyê û li Tirkiyeyê çareseriya adil û demokratik a pirsgirêka kurd, ji bo

rizgariya Firat û Dicleyê şertên pêwîst in. Ji ber vê nêzîkbûna gelan a ji aştiyê re û azadiya çeman divê di heman têkoşînê de bigihîjin hev.

Gelên ku avê azad dikin, dikarin aştiyê jî bihonin. Azadkirina herikîna çeman, azadkirina jiyana kolektîf a vê erdnîgariyê ye.

### 1.2 Ji Bo Jiyana Hevpar Vegotinekeke Nû

Em bangê li hikûmetan, akademî û medyayê dikin, dev ji zimanê ku avê dike amûrê pevçûnê an jî avakirina hegemoniyê berdin. Her nêzîkatîya ku avê dixe nav rojev û ajandayên sermaye û desthilatdariyê, derbeke nû li bîra vê erdnîgariyê dixe. Avakirin û pêşxistina zimanekî ku avê wekî hebûnekê dibîne û azad dike, berpirsiyariya me ya hevpar e.

Çîroka Mezopotamyayê çîroka çemên wê ye jî. Ev çîrok, zanîn û bîra qedîm a bi hezaran salan e, berxwedana jiyanê ye. Ev girêdana bi avê re, zimanê herî safî yê âştiyê ye. Ev ziman ji armancên sermaye û dewletên bêdemokrasi pak bûye. Ew azadiya jiyanê esas digire û bi nefesa hevpar a gelan tê hebûnê. Her kesê ku zimanê çeman bihîstiye, dizane: Âştî di dengê avê de mezin dibe.

### 1.3 Hevgirtina Navneteweyî

Ji bo pêvajoyên âştiyê, hevgirtina navneteweyî û girêdana civakî ya xurt hewce dikin. Serkeftina lêgerîna âştiyê ya li Tirkiye, Sûriye û herêmê bi piştgiriya hemû gelên herêmê pêkan e.Hilweşîna ekolojiyê ya li Mezopotamyayê bûye wêraniya bêsînor û metirsîya ewlehiyê ya cîhanî.Ji ber vê yekê civaka navneteweyî berpirsiyar e ku âştî û edaleta ekolojiyê bi hev re biparêze. Her piştgiriya ji âştiyê re, piştgiriya ji jiyana li gorî ekolojiyê, biazadî herikîna çeman û edaleta civakî re ye.

### 1.4 Têkiliya Me Bi Avê Re Ji Binî Ber Bi Jor Ve

Divê em ji gund, tax û bajaran dest pê bikin û komînên avê ava bikin ku tê de gel, ekolojîst, lêkolîner, rêxistinên demokratîk, jin û karker bi nûnerên xwe beşdar bin. Ev komîn wê bibin bingeha rêxistineke civakî ya nû ku azadiya avê û mafê gotinê yê gelan di navenda xwe de bigire. Armanca me ya bingehîn avakirina **Meclisa Avê ya Mezopotamyayê** ye ku bibe federasyona van pêkhateyan.

Ev meclis wê bibe weke saziyeke ku dengê vîna hevpar a xwedî li azadiya çeman û jiyanê derdikeve û wê rêyekê polîtîk a nû ava bike ku nerîneke azadîparêz a avê pêş bixe.

### 1.5 Naskirina Çeman Wekî Hebûnên Zindî

Çem ne "çavkanî" ne ku pergalên baviksalar û kapîtalîst wan wiha pênase dikin, ew hebûnên zindî ne û divê ev rewşa wan di asta neteweyî û navneteweyî de bê misoger kirin. Ji bo naskirin û parastina statuya çeman, divê bi rêxistinbûneke cîhanî têkoşîn bê meşandin. Girêdana manewî ya bi çeman re ku bîr, çand û pêşeroja gelan in, divê bê kûrkirin. Herêmên(hawzayên) ku bi herikîna avê xwedî dibin, divê ji qadên berjewendî û desthilatdariya hêzên serdest bên derxistin.

Ji bo naskirina statuya çeman wekî hebûnên zindî, em ê têkoşîneke hiqûqî ya berfireh bimeşînin. Li dijî bendavên ku çeman seqet dikin, projeyên din ên destwerdana avê, polîtîkayên ewlehiyê û teşebbûsên sermayê, divê komeke xebatê ya taybet bê avakirin ku çarçoveyeke hiqûqî ava bike û tê de çem wekî hebûnên xwedî maf û vîn bên naskirin.

### 1.6 Koalîsyona Bajarên Çemên Mezopotamyayê

Divê di navbera bajarên dilê Mezopotamyayê yên wek Amed, Silêmanî, Basra, Hesekê, Mûsil, Bexda û Ehwezê de torên hevgirtinê bên avakirin. Ev girêdanên navbera bajaran divê bi dîplomasiya gel bên xurtkirin.Torên hevgirtinê yên ku gel bi vîna xwe ava bikin, wê azadiya avê û avakirina âştiyê mezin bikin û di heman demê de ew ê îsbat bikin ku sînorên dewletên neteweyî yên sexte çiqas bêwate ne. Ev tifak ew ê herêma avê biparêze, li dijî astengiyên li ber herikîna çeman têbikoşe û xetekê rêxistiniya kolektîf ava bike ku ji hêza deshilatdariyê derbas bike.

### 1.7 Prensîbên Bingehîn ên Ji Bo Edaletê

Rêya gel bi awayeke adilane bigihîjin avê, ji parastina avê û hemû ekosîsteman derbas dibe. Avzêyên Mezopotamyayê, qamirgeh, daristan, hemû qadên jiyanê yên ku bi avê dijîn û zeviyên çandiniyê yên cotyarên biçûk, bîra hevpar a vê erdnîgariyê ne.Parastina van qadan hem ji bo edaleta ekolojiyê hem jî ji bo edaleta civakî şertekê pêwîst e. Divê azadiya avê û jiyanê bê parastin. Av nayê kirîn û firotinê, amûrê bazirganiyê nîne. Av bi hinceta ewlehiyê, nikare veguhere amûreke hegemonyayê. Her polîtîkaya ku dest deyne ser avê, divê wekî êrîşeke li dijî vîna gelan bê dîtin. Ji ber vê yekê azadiya avê şerta herî bingehîn a azadiya gelan e.

## 2 Li Hemberî Wêrankirina Avê, Edaleta Av û Avhewayê: Ne Avahiyên Desthilatdariyê, Azadiya Avê

Divê nêrîna wêranker, navendî û li gorî berjewendiyên şirketan a di polîtîkayên avê de bê terikandin. Ev nêrîn rêxistineke desthilatdariyê ye ku çeman dîl digire û jiyana gelan dixe bin berjewendiyên berhevkirina sermayê. Peymana civakî ya gelan, vê sazûmaniyê red dike û xetekê berxwedanê ava dike ku azadiya avê esas digire. Ev berxwedan vîna gelan li dijî hegemoniya ku polîtîkayên sermaye yên ewlehiyê ava kirine, mezin dike. Ji ber vê yekê her polîtîkaya ku avê diparêze, pêşeroja hevpar a gelan diparêze. Di vê xetê de her polîtîkaya ku em pêş bixin, wê herikîna azad a avê û jiyana Mezopotamyayê esas bigire.

### 2.1 Wêrankeriya Projeyên Pir Mezin û Madenvaniyê Rawestînin

Divê Bendava Farqînê (Sîlvan) ya berdewam, Bendava Cizîrê û hemû bendavên biçûk û mezin ên nû yên planbûyî, HES (santrala Hîdroelektrîkê) û proje yên avdaniya mezin bên rawestandin. Ev proje destwerdaneke sîstemîk e li ser avê, axê û çanda jiyana hevpar a gelên Mezopotamyayê û ji bilî wêrankirina ekolojiyê ti encameke din nedaye. Divê hemû veberhênanên enerjîyê yên ku ne xwedî pêvajoyeke nirxandina serbixwe ne û xizmeta hewcedariya gel nakin, hemû çalakiyên madenê û hîdrokarbonê bên dawîkirin. Ev çalakî daristan û cihêrengiya biyolojîk tune dikin, avên binerd û sererdê qirêj dikin û herêmên avê vediguherînin qada desthilatdariya sermayê.

### 2.2 Rakirina Binesaziyên Zerardar Ên Heyî

Ji bo azadiya avê, divê bendavên mezin û wêranker ên ku avê ji jiyanê qut dikin, bi awayekî gav bi gav bên rakirin. Li gorî tecrûbeyên navneteweyî yên salên dawî, feydeyên ekolojiyê û civakî yên her projeya rakirina bendavan ji bendewariyên destpêkê zêdetir bûne. Ev binesazî çeman dîldigirin û jiyana mirovan dixin xeterê. Rakirina bendavan gaveke pêwîst e ji bo vegerandina halê xwezayî ya herikîna çeman û vegerandina mirovên koçberbûyî ji bo cih û warên wan ên ku bi sedsalan lê dijîn.

## 2.3 Agroekolojî û Serweriya Xwarinê

Divê di çandiniyê de pratîkên monokultûra giran bên terikandin. Modela çandiniya endustriyê ya ku axê û herêmên avê îstîsmar dike, hebûna avê ya vê erdnîgariyê dixe xeterê. Li şûna wê, divê hilberîna agroekolojiyê ya ku zanîna çandiniya kevneşopî jî dihewîne bê esas girtin. Nêzîkbûna agroekolojîk çerxa xwezayî ya axê diparêze û modela hilberînê ya ku avê dîl nagire mezin dike û jiyanê xwedî dike.

Ev veguherîn ji bo bidestxistina serweriya xwarinê şertekê pêwîst e. Serweriya xwarinê tê wateya ku gel bi vîna xwe hilberîna xwe li gorî hewcedariya xwe bi rê ve bibin û bereketa axê ne li gorî berjewendiyên şirketan, lê li gorî îradeya civakan be. Dema hilberîna agroekolojiyê bi azadiya avê re digihîjin hev, potansiyela xwebixwe xwedîkirina gelan zêde dibe. Têkiliyên girêdayî û bendewariyê yên ku çandiniya endustriyê afirandine diqedin û bi rêya civakên hilberînê û kooperatîfan re, em dikarin krîza xwarinê derbas bikin û çareseriyekê bidest bixin.

## 2.4 Çareseriyên Saziyî

Rêxistinên pîşe û karkeran, meclîsên jinan, rêxistinên ekolojiyê û bajarvaniyê, rêveberiyên xwecihî, zanîngeh û hikûmet divê li şûna mezinkirina wêraniya ku projeyên pir mezin (mega) çêdikin, piştgiriyê bidin çareseriyên ku ji herêmê bilind dibin. Ev piştgirî wê bibe bingeha nêzîkbûneke ku vîna gel esas digire, azadiya avê li pêş digire û ekosîsteman diparêze. Tu projeya ku mafê gotinê yê gelan nas nake, ne rewa ye. Komînên ku gel ava kirine, meclîsên xwecihî û rêxistinbûnên li ser herêmên avê, hilgirên rastîn ên vê polîtîkayê ne. Ji ber vê yekê divê hemû sazî di xetekê de ku vîna civakên xwecihî xurt dike, berpirsiyariyê bigirin ser xwe.

## 2.5 Çavdêriya Xwecihî û Serweriya Daneyan

Divê di herêmên çeman de pergalên çavdêriya civakî bên avakirin. Zanîna li ser avê, milkê hevpar ê gelan e û ji destê tu desthilatdarî an hêza sermayê re nayê hiştin Ji ber vê yekê divê hemû dane bên parvekirin, parastin û hemû kes karibin bigihîjin van daneyan. Zelaliya daneyan ji bo parastina ekosîsteman gelekî girîng e. Li dijî bazirganî û talankirina avê ya li ser navê polîtîkayên ewlehiyê, divê xetekê çavdêriya civakî bê avakirin. Di heman demê de divê zanist ji destê sermaye û desthilatdariyê bê xilaskirin. Ji ber ku zanîna ku azadiya avê diparêze, tenê bi akademiyên azad ên serbixwe, li gorî hewcedariyên civakî û bi bingeha zanîna qedîm a gelan dikare bê afirandin. Mafê gotinê yê gelan bi gihîştina zanînê xurt dibe. Divê raporên tahribatê bên amadekirin, bi awayekî domdar bên nûkirin û daneyên bidestxistî bi awayekî vekirî pêşkêşî civakê bikin.

## 2.6 Komînên Enerjiyê

Projeyên nûkler, jeotermal, enerjiya rojê û bayê yên ku ne li gorî hewcedariyên gel in û di destê şirketên taybet de ne, rûyê xapînok ê "kapîtalîzma kesk" in. Ev proje bi gotina veguherîna li gorî ekolojiyê, desthilatdariya sermayê ji nû ve diafirînin û qadên jiyanê yên gelan careke din dixe bin desthilatdariyê.

Armanca me ne modelên enerjîyê ne ku berjewendiyên şirketan mezin dikin. Armanca me modelên enerjîyê ne ku aîdî civakan in, ji herêmê tên rêxistinkirin, mafê gotinê yê gel û edaleta ekolojiyê esas digirin. Divê komîn û kooperatîfên enerjîyê yên li gorî hewcedariyan bên avakirin û ev kooperatîf divê bibin xetekê azadî û serbixwebûnê ku gel bi rêxistinbûna xwe bi xwe enerjîya xwe hilberîne.

### 2.7 Pêşîgirtina Liqirêjiyê

Divê bandorên wêranker, qirêjker û jehrîker ên ku ji înşaat, sanayî, çandinî, maden, hilberîna enerjîyê û bermahiyên leşkerî yên li ser jiyanê, bên rawestandin. Ev polîtîka ax, hewa û avê qirêj dikin, yekbûna herêmên avê xera dikin, çerxa avê dibirin û qadên jiyanê yên cûreyên zindî tune dikin. Bermahiyên kîmyewî, avêtinên endustriyê, dermanên çandiniyê û bermahiyên toksîk ên madenan çeman jehrî dikin. Ev jehrbûn ji masiyan heta çûkan, ji mirovan heta nebatan, hemû dînamîkên jiyanê dixe xeterê. Herêma avê ya Gola Wanê ji ber qirêjbûn, avêtina bermahiyan û çêkirina avahiyan ya bêkontrol, bi lez tê wêrankirin û ev wêranî hemû ekosîstema ku golê xwedî dikin dixe xeterê. Rizgarkirina Gola Wanê ji bandorên qirêjker, ji bo ku hemû golên Mezopotamyayê nekevin rewşa hilweşîna Gola Urmiyê, parçeyeke têkoşîna avê girîng e ji bo parastina hebûna avê ya Mezopotamyayê. Ya ku tê qirêjkirin tenê av nîne, hilweşîna hemû erdnîgariyê ye. Ji ber vê yekê divê hemû çalakiyên ku qirêjbûnê diafirînin bên rawestandin û stratejiyên pêşîgirtinê yên bi tevahî ku avê diparêzin bên avakirin.

## 3. Dîplomasiya Avê ya Gelan

Ziman awayê pêkanîna polîtîkayê ye û divê zimanê diplomasiya avê bîra çandî ya gelan û pirzimanî, pirbaweriya Mezopotamyayê esas bigire. Divê koma xebatê ya kolektîf bê avakirin ku tê de diplomasiya bi zimanên gelan bê pêşxistin. Diplomasiya avê divê ji destê dewletan û şirketan bê derxistin û bibe cihekî ku pirtebeqeyî ya navendcivakî ku bi vîna gelan teşe digire. Biryarên li ser herikîna çeman divê bi awayeke veşarî neyên girtin. Ev biryar divê di komîn û meclîsên ku gel ava kirine de bên girtin. Tu diplomasiya ku berhevkirinên zanîn û vîna gelan înkar dike, nikare âştîyê ava bike. Ji ber vê yekê diplomasiya avê divê bibe qadeke têkoşîna kolektîf a ji xwecihiyan bilind dibe, ku tê de jin, gundî, rêxistinên ekolojiyê, rêxistinên girseyî yên demokratîk û saziyên karkeran diyarker bin.

### 3.1 Tevahîbûn û Zelalî

Divê em destûrê nedin peymanên avê yên veşarî. Ev cure danûstandinên veşarî çeman ji gelan û ekosîsteman qut dikin. Avê vediguherînin amûrê têkoşîna hêzê ya dewletan û qezenca şirketan. Divê vîna saziyên kolektîf û demokratîk ên ku di herêmên avê de bên avakirin, di biryarên herêmî de bê esas girtin. Ev avahî bi temsîla mafê gotinê yê gelan, divê bibin zemîna yekane ya rewa ku azadiya avê diparêze. Biryarên ku pêşeroja çeman diyar dikin, tenê bi van avahiyên kolektîf ên ku gel ava kirine dikarin bên girtin.

### 3.2 Misogerkirina Azadiya Avê

Heta ku av û çemên li herêmên avê yên Mezopotamyayê bi temamî azad bibin, divê **Tora Foruma Avê ya Mezopotamyayê** di pêvajoyên diplomasiyê de wekî nûnerê vîna hevpar a gelan bê naskirin. Ev tor avahiyeke rewa ye ku vîna gelan temsîl dike û di hemû biryarên herêmî yên ku azadiya avê diparêzin de mihatabê bingehîn e. Pêşeroja çeman wê bi vîna kolektîf a gelan bê diyar kirin û ev tor wê bibe barhilgirê rêvebirina polîtîk yê pêvajoya azadbûnê. Ev tor divê hêza xwe ji kolanan û heqîqeta civakî bigire.

### 3.3 Pêkanîna Peymanên Navneteweyî

Divê peymanên heyî bi awayekî bibandor bên pêkanîn. Dema vîna gel di van peymanan de neyê nîşandan, tê wateya pêşeroja avê veşarî hatiye diyar kirin û ev rewş ne rewa ye,

nayê qebûlkirin. Peyman divê bi mantikeke ku avê dîl digire û dike amûrê qezencê neyên çêkirin. Polîtîkayên ku jiyan û avê diparêzin divê esas bên girtin. Dema peymanên nû tên amadekirin, mafê gotinê yê gelan divê diyarker be û prensîba azadiya avê û jiyanê divê bibe bingeha hemû biryaran. Tu peymana ku herikîna çeman, yekbûna ekosîsteman û vîna gelan esas nagire, ne rewa ye.

### 3.4 Rista Rêvebirinên Xwecihî

Divê rêvebirînên xwecihî yên bajêr û jingehên qerexê çeman, di pêvajoyên dîplomasiyê û polîtîkayên têkildarî avê de risteke diyarker bigirin ser xwe. Pêşeroja çeman ji biryarên navendên dûr re divê neyê hiştin. Mijarên têkildarî şûngehan divê bi pêvajoya vîna hevpar ya xwecihiyan bê diyarkirin. Ji ber vê divê rêvebirinên xwecihî vîna hêmanên kolektîf a parastina avê esas bigirin. Ev hêman mafê gotina gelan. Ev avahî wê bibin hêmanên rewa yên ku mafê gotinê yê gelan temsîl dikin û hêzên ku diplomasiyê ji binî ve birêxistinî bi rê ve dibin.Bi nêrîna ekolojiya civakî, di çarçoveya "Polîtîkayên Avê û Herêmên Avê yên Demokrasî-Ekolojiyê" de, hemû rêveberiyên xwecihî, bi taybetî şaredarî, divê prensîb, polîtîka û armancên têkildarî rêveberina avê diyar bikin û li gorî wan tevbigerin.

### 3.5 Tora Ragihandinê ya Xurt

Ew ê webinarên birêkûpêk, komên e-postayê û mekanîzmeyên çavdêriya hevpar bên avakirin. Ev tor wê bibin xetekê ragihandinê ya ku zanîna gelan parve dike, avahiyên kolektîf ên ku avê diparêzin xurt dike û hevgirtinê li seranserê Mezopotamyayê domdar dike.

### 3.6 Plana Çalakiya Lezgîn a Hesekê

Stasyona Avê ya Alûkê ya li nêzî Serêkaniyê ku di sala 2019'an de ji aliyê komên çekdar ên girêdayî Tirkiyeyê ve hatiye dagirkirin, divê ji kontrola van koman bê derxistin û bi temamî wekî herêmeke vekirî ji bo gihîştina mirovî bê ragihandin. Bi vî awayî divê rê li ber birîna ava vexwarinê ya Hesekê bê girtin. Ev gav lezgîn e ji bo ku av ji rola amûra zext û çeka şer bê derxistin û mafê jiyanê yê gelan bê parastin. Ji ber lezgîniya rewşê, divê heyetekê bê diyarkirin ku li herêmê çavdêrî, têkilî û raporkirina xerabûnê pêk bîne. Divê li ser vê bingehê bang li aktorên navneteweyî bê kirin ku hesas nêz bibin û pirsgirêk di demeke herî kurt de bê çareserkirin.

### 3.7 Koma Xebatê ya 'Diplomasiya Avê ya Jinan'

Li herêmê divê komeke taybet a diplomasiya avê bê avakirin ku ji aktivîstên ekofemînîst, meclîsên û rêxistinên jinan pêk bê û têkoşîna li dijî baviksalariyê di diplomasiya avê de bi awayekî xwerû û taybet pêş bixe. Bi Koma Diplomasiya Avê ya Jinan re, bingehekî kolektîf bê avakirin ku tê de wekheviya zayendî ya civakî, nêrîna azadîxwaz a jinan û rola pêşeng a jinan di têkoşîna avê de bigihîje xeta edaleta ekolojiyê û azadiya civakî.

### 3.8 Hevgirtina Dersînor

Ji bo parastina parêzvanên avê, pêşxistina stratejiyên doza hevpar û têkoşîna bi hev re li dijî kirkirina ekolojiyê, mekanîzmeyên hevgirtinê wê bên xurtkirin. Ev mekanîzma wê

bibin torên berxwedanê yên kolektîf ku gel hev û du tenê nahêlin û parêzvanên azadiya avê di xetekê têkoşîna hevpar de bicivin.

### 3.9 Pêşxistina Kapasîteya Hiqûqî û Akademîk

Ji bo bikaranîna bi bandor a hiqûqa avê ya navneteweyî, divê torên parvekirina zanînê û veguhestina tecrûbeyan bên avakirin. Ev tor wê bibin xetekê hevgirtinê ya ku mafên çeman diparêzin, pêvajoyên hiqûqî bi vîna gelan dimeşînin û azadiya avê diparêzin.

### 3.10 Dîplomatiya Pirqanalî

Em ê prensîbên Deklarasyona Kathmanduyê ya 2025an qebûl bikin ku dîplomasiya avê û parastina mafê jiyanê yê hemû zindiyan û hevkariya gel/civatên xwecihî esas digire. Ev nêzîkatî ji kevneşopî, çand û rûmeta gelên xwecihî re rêzdar e û hevgirtina di navbera çandan de esas digire.

## Weke Encam

Foruma Avê ya 2'yemîn a Mezopotamyayê bû gaveke ku têkoşîna li Silêmaniyê dest pê kiribû, mezin kir. Ev civîna ku bi vîna gelên Mezopotamyayê hate avakirin, ji bo azadiya avê asteke nû afirand. Wê nîşan da ku bi xetekê siyasî ya çeman li pêş digire, âştî dikare bê avakirin û nîşan da gelên ku avê azad dikin, dikarin pêşeroja xwe jî azad bikin.

Dema em ji Amedê herin warên xwe, em xwe wekî kesên belavbûyî nabînin. Em niha parçeyên xeteke hevpar in. Em tevgereke yekgirtî ne ku ev tevger Tora Avê ya Mezopotamyayê mezin û fireh dike. Em ê azadiya çeman, vîna gelan û zimanê âştiyê bigihînin hemû aliyên Mezopotamyayê.

Em ê biryardariya avakirina komînên avê û avahiyên kolektîf ên ku avê diparêzin, di qadên xwe de pêk bînin. Em ê li gundan, taxan û bajaran hêmanên kolektîf ku avê diparêzin ava bikin û van hêmanan di Meclîsên Avê de ku li seranserê Mezopotamyayê dicivin, bînin cem hev. Ev meclis wê bibin hilgir û pêkhênerên peymana civakî ya nû ku azadiya avê û jiyanê diparêze.

Em soz didin ku rihê vê forumê, gotina wê, wêrekiya wê û biryara wê bigihînin herêmên xwe. Ji bo mafê gihîştina avê û mafê çemên zindî, em ê di milên hev de bimeşin. Em ê li her dera Mezopotamyayê têkoşîna hevpar li dijî bendav, maden, polîtîkayên avê yên ewlehiyê û qirkirina ekolojiyê mezin bikin.

Ji bo amadekarîya foruma bê, em ê di navbera Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiyeyê de Komîteyeke Avê ya Serbixwe ya navbera civakan ava bikin. Em ê hevgirtina navneteweyî xurt bikin ji bo parastina golên xwe, çemên xwe, avzêyên xwe û hemû cûreyên zindî.

Di avêtina her gava xwe de, em ê ji bo âştî û avakirina azadiyê bixebitin, da ku di Forumên Avê yên Mezopotamyayê de bicivin. Em dizanin dema ku çem bi azadî diherikin, âştî kok digire. Jiyana hevpar a Mezopotamyayê wê bi azadiya avê ji nû ve bê nivîsandin.

Ji bo lidarxistina Foruma Avê ya Mezopotamyayê ya pêşerojê li Başûrê Iraqê be, em dest bi amadekarîyan dikin

Em ê li ser axên ku Dicle û Firat digihîjin deryayê, li erdnîgariya ku avzê û qamirgehên Mezopotamyayê bi sedsalan jiyanê xwedî kirine, ev soza me ya hevpar e ku em werin cem hev. Em hemû gel, civak û rêxistinên ku herikîna azad a çeman diparêzin, vedixwînin vê civînê.

Azadkirina çemên Mezopotamyayê tê wateya parastina mafê jiyanê yê hemû zindiyan. Tu têkoşîna azadiyê bêyî parastina cihêrengiya cûreyan temam nabe. Ji nû ve avakirina têkiliyeke simbiyotîk bi xwezayê re û bi nêrîna "di nav cihêrengiyê de jiyana bi hev re", em ê bi dar, av, kêzik û hemû zindiyan re bi hev re bijîn û têkoşîna xwe li ser vê rêgezê bidomînin. Em ji hemû kesên ku beşdarî vê civînê bûne û ji dostên hêja yên ku bi dil û can tev li vê hewldanê bûne re, serkeftinê dixwazin û silav û rêzên xwe pêşkêş dikin.

**Av Hebûn e! Av Jiyan e ! Av Aşîtî ye!**

**Em Aştiyê Esas Digirin, Komînbûna Av, Ax, Enerjiyê Pêk Tînin, Jiyana Azad Ava Dikin.**

**<u>Gelên Ku Avê Azad Dikin, Jiyanê Azad Dikin, Âştîyê Mezin Dikin…</u>**

**Komîteya Amadekar ya Foruma**
**Avê ya 2yemîn a Mezopotamyayê**